



**IFMETALL**



**12**

**xalên  
baş  
bi**


**peymanana kolektîfî**

### 1. Garantîkirina mûçeyên herî kêm û zêdekirina mûçeyan



Bi peymanana kolektîfî, we mûçeyek hindiktirîn garantî heye û her weha mafê we yê zêdekirina mûçeyên birêkûpêk heye. Di qanûnê de, ji bo ku kêmkirina mûçeyan çî sînoreke jêrîn tune. Berevajî vê, di peymanana kolektîfî de çî sînoreke jorîn tune.

### 2. Ji bo katên karên dema nerehet, zêde pere tê dayîn




Ji bo ku hûn di demên karên nerehetiyê de dixebitin, wek êvar, şev, dawiya hefteyê û li betlaneyê, ji we re drav tê dayîn. Ji vê re bi swêdî obtillägg te gotin

### 4. Pêveka alîkariya Föräldrapenningtillägg (dirava dêbavan)



Ev ji bilî Föräldrapenningen (alîkariya bo dêûbavan) ya dewletî ye û di dema îzna dêûbavbûnê de tezmînata zêde dide we.



### 3. Teqawitiya zêde

Hûn teqawidiya kar a bi hev re ya lihevkiirî distînin ku teqawidiya giştî temam dike û her weha îmkana dayîna teqawidiya nîvdemî.




### 6. Meaşê tatilê

Ji bo ew kesên ku mûçeya saetî werdigirin, bo betlaneyên ku dikevin rojên hefteyê, heqdestê xwe werdigirin. Û hûn ên ku mûçeyê mehane werdigirin, dema ku betlane dikevin rojên hefteyê, ji mûçeyê we kêmkirin.

### 5. Mercên betlaneyê yên çêtir

Piraniya peymanên kolektîfî ji tiştên ku qanûn diyar dike çêtir şert û mercên betlaneyê didin we.



### 8. Sîgorteya Ewlekariyê di rewşên xisara di dema kar de

Heger tu xwe li ser kar yan jî li ser riya kar birîndar bikî hingê tu dikarî tezmînata aborî bistîni.




### 7. Kurtkirina saetên xebatê

Gelek peymanên kolektîfî bêyî kêmkirina mûçeyê we katên xebata kurttir didine we.




### 10. Piştgiriya ji bo veguherînê

Heger hûn ji kar werin derxistin an jî dest ji karekî demkî bihêlin, hûn dikarin ji bo peydakirina karekî nû, yan ji bo destpêkirina karsaziya xwe yan jî dest bi xwendinê alîkarî werbigirin. Hûn dikarin rahêbereke şexsî û şîretên bo kar û xwendinê bistînin. Heger tu ji CSN'ê (Centrala studiestödsnämnden) piştgiriya xwendinê ya veguherînê distîni, bi rêya peymanana kolektîfî jî tu alîkariyeke zêde distîni.



### 9. Sîgorta tenduristiyê ya serzêde

Heger hûn ji 14 rojan dirêjtir nexweş bin, hûn dikarin ji bilî alîkariya nexweşiyê ya asayî, pereyên din jî bistînin.



### 11. Heger hûn ji kar bên avêtin, heqê jikardexistinê

Heger hûn ji kar bên avêtin, dibe ku hûn tezmînata darayî bistînin ku ji we re bibe alîkar heya ku hûn karekî nû bibînin.



### 12. Hêza kolektîfî

Bi riya peymanana kolektîfî, ew sendîka ye ku bi kardêr re danûstandinan dike, daku hêza danûstandinê ya mezintir û şert û mercên çêtir dide we.